

Ji bo ku bibî mişteriyê bankê

Ji bo ku li bankeka swêdî bibî mişterî, divê tu xwe bidî nasîn û bersivê bidî ka çima hesabekê bankê ji bo te pêwîst e. Li vir rê nîşanî te tê dan ka pêwîstiya bankê bi kîjan agahdariyan ji te heye gava tu serdana bankxaneyekê dikî.



Xwenasandin

Divê tu her gav karibî xwe bidî nasîn.

1. Tu dikarî bi belgeyeka nasnameyê ya swêdî ya qanûnî, wek pasport, nasnameya welatî yan BankID-yê, xwe bidî nasîn. Tu dikarî jî bi ajotinameya swêdî xwe bidî nasîn.
2. Heger belgeyeka nasnameyê ya swêdî ya te tune be, tu dikarî bi pasporteka welatê xwe ya qanûnî yan belgeyeka din ya nasnameyê ya biwêne ya ku welatîbûna te diyar dike xwe bidî nasîn. Divê daîreyeka resmî yan cihekê din yê eleqedar ew belge derxistibe. Agahdar be ku mimkin e bank bixwaze ku tu belgelyên zêdetir pêşkêş bikî.
3. Heger belgeyeka te ya nasnameyê ya muteber tune be, divê tu karibî bi hin belgeyên din yê ji çavkanîyeka bêalî û pêbawer diyar bikî ka tu kî yî û ji kîjan welatî yî.

Xwendekarên biyanî

Heger tu xwendekarê biyanî bî, divê tu karibî li gor xalên jorê xwe bidî nasîn. Ev jî pêwîst in:
- Destûra îqameyê yan vîza (ne ji bo welatîyê Yekîtiya Ewropayê)
- Bersiva qebûlkirinê ji zanîngehê ku mideta xwendinê diyar dike

Pêwîstî bi hesabê bankê

Divê tu bikarî îzah bikî ka çima pêwîstiya te bi hesabekê bankê heye û tu dê çawa wî hesabî bi kar bînî.

Mimkin e ew ji bo wê be ku tu meaşê xwe yan bedeleka din tê de razanî, kirêyê bidî yan pereyan hilînî. Mimkin e ku bank pirsên din ji te bike da ku zanyariyên bêtir li ser te wek mişterî bistîne.

Mafê hesabekê bankê...

Di esil de, îmkana bidestxistin û bikaranîna hesabekê bankê - yê ku daxilî garantîya pererazandinê ya dewletê ye - û xizmetên peredanê yê bingehî ji bo her kesî vekirî ye. Ev heq ji bo te heye ka tu welatîyê kîjan welat bî û ka nimreya te ya şexsî ya swêdî hebe yan tune be.

...lê, bank di hin haletan de neçar e daxwaza te ya vekirina hesabî red bike

Çênabe bank hesabî veke heger:

- Bank bi awayekê تمام ewle nikare te nas bike.
- Bank biryarê bide ku agahdariyên ka çima tu dixwazî hesabekî vekî yê ku tu didî têrê nakin.
- Bank bi vekirina hesabekî qatîdeya qanûnekê yan biryarekê pêpes bike.

Mafê bankê heye ku daxwaza te ya hesabekî red bike heger tu pêştir li gel bankê newefadar bûbî.

Ji bîr neke ku ...

- divê tu pirsyarên bankê fêm bikî û karibî bersivê bidî. Divê jî tu agahdariyan yê ku bank dide te fêm bikî.
- Heger pêwîstiya te bi kesekî hebe ku tercumanîyê ji te re bike, divê tu wî kesî bi xwe re bibî hevdişinê bi bankê re.
- Bank dê bipirse ka pereyên te ji kû tî.
- Bêyî ku peymanek bi bankê re hebe, çênabe kesekê din hesabê te û xizmetên din yê ku bankê bi kar bîne.
- Mimkin e bank pirsên zêdetir bike yan şertên din bide.

Agahdariyên zêdetir

Ji bo agahdariyên zêdetir, qesda banka eleqedar bike.

Agahdarî li vir jî hene:

Parlamentoya Swêdê:

Qanûna (2017:630) ya tedbîrên dijî pereşûştin û finanskirina terorîzmê. Di www.riksdagen.se de zêdetir bixwîne

Çavdêriya aborî:

Biryarên Çavdêriya aborî li ser tedbîrên dijî pereşûştin û finanskirina terorîzmê.

Di www.fi.se de zêdetir bixwîne



Svenska **Bankföreningen**
Swedish Bankers' Association

www.swedishbankers.se

Komeleya bankan ya swêdî:
Agahdarî li ser tedbîrên
bankan dijî pereşûştin û
finansekirina terorîzmê.
Di www.swedishbankers.se
de zêdetir bixwîne

Daîreya deynan ya dewletê
Agahdarî li ser garantiya
pererazandinê
Di www.riksdagen.se de
zêdetir bixwîne



Svenska **Bank**föreningen
Swedish Bankers' Association

www.swedishbankers.se